

.SAL 1  
HEJMAR 12  
DUŞEMB  
1 ADAR 1943

# RONAHÎ

ANNEE 1  
NUMÉRO 12  
LUNDI  
1 MARS 1943

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



## BIREK JI XORTËN KURDËN IRAQË ÈN XWENDA

Ev xortën ha birek ji xwendevanên me yên Iraqê ne. Van xortan ev resim bi hênceta cejineke mili ji çapxana me re diyari kiri bûn. Em vî resimi fro bi şahike mezîn belav dîkin. Xwedê wan zêde bike û ji miletê kurd re bîhile.

Navêx xotan ji milê rastê, ber bi çepê ve:

Rêza pêşîn: Mihemed Sidiq Tahir, Ehmed Mistefa Amêdî, Elaedîn Sejd, Şewket Ehmed, Mihemad Reşid, Eli Hesen. — Rêza didowan: Small Sejd Doskî, Ehmed Neman, Esker Şehbaz, Remezan Mihsin, Fazil Seid, Kemal Erbilî.

Rêza sisayan: Ziya Xorşîd, Seid Hacî, Izet Mistefa, Mihemed Seid, Horsîd Hevlîr, Ehmed Zeyno, Mistefa Brahim, Hesen Hacî, Isam Hevlîr, Hesen Hemîd.

ŞAM — 1943  
ÇAPXANA SEBATÊ

## DI VÊ MEJMARÊ DE

Roviye gér	Girokbêj
Cetelê aixê	Sîrvan
Ji Honkongê	Sîlêmanê Ferho
Mehkema Hawarê	Ehmed Namî
Gelawêj	Ronahi
Mela Enwer	Ermeşanî
Min nizanî bû	Üsif Hesihersan
Serbestî	Mela Enwer
Wa mîletê kurdi	Ehmed Namî
Mil û Zil	Herekol Azîzan
Nema dikari bû	Cenîlê Tacdo
Gurê Pir	Osman Sebrî
Tîstên rast	Hesen Hîşyar
Besta Welati	Mela Enwer
Hinek ji Henek	Yariker
Li Welatê Çinê	Osman Sebrî
Hindîk Rîndik	Xeberghêz
Mist-Awik	Osman Sebrî
Çiroka Seyan	Nêçîrvanê Hawarê
Roji	Bijîskê Hawarê
Li şûna berêz	Hesenê Mistê

## ÇIROKA KURDMANCI:

### ROVIYE ŞER

Şerek hebû. Carekê meyizand, gava, vaye rovîk ji wê ve hat. Sér jê re got, go rovî çima tu wilo belengaz bûyi û pirça dûvê te weşihaye.

Go, ey sultanê heywana, ev sal xerab bi ser min de hat û ez wilo sepirze bûm. Sér go, gelo ko ez te têr bikim tu çi dibejî. Go, pa tiştek ji vê çêtir heye ko ez vê sala ha têr bixwim.

Sér go, meyizîne ci tişte ko ez ji te re bêjim tu li min vegerine. Go, belê ezbeni. Go çavên min çawan in? Go, çavên te çavên şeran in. Go, pûrta min çawa ye? Go miwén te weke singen di zirhan sekinine. Go, serê min çawa ye? Go, serê te serê betla ye. Go, lepên min çawan in? Go, lepên te lepên şeran in.

Sér go, de rabe bide pey min. Rovî da pey û çûn gihane mérgekê weke mérge selekûnê. Malûm e ko hesp û hêsti-rênen hesinan tê de ne. Sér bergilek ji wan ên qelew eyișand û lepek lê da, ji rovî re kire kerma goşt û gote rovî; go dê, vê carê rabe û bixwe û rûne û bixwe û herçi cara ko tu birçi bibî bi ser min de were. Rovî ji kete ser goşt û xwar.

Rojekê, didiwan, sisayan, heta ko

çavên wi sor bûn. Rojekê dit gava vaye rovik bi ser de hat ko ew ji we wi û wextê berê xerabtit.

Jê re go, bira tu çima wilo séfil bûyi? Go, bira ma tu nizanî ko ev sala ha xela ye. Go kuro, meyizê, tişte ko ez ji te re bêjim li min vegerine. Go, belê ezbeni. Go, çavên min çawan in? Go, ne wilo bêje. Go lê ez ci bêjim. Go, bêje çavên te çavên şera ne; pûrta te pûrta wek singen di zirha ne.....

Roviye têr ew hin kir û wi ji mina ê din goti bû şer jê re got û go serê te serê bella, lepên te lepên şera ye.

Roviye têr da pêşiyê ê séfil da pey, heta gihane mérge selekûnê. Hema çawan gihan bergilê ewil, roviye têr xwe zer kire paşıya wi. Go, belkti ewê weke şer bergil bavêje erde. Lé ne wilo derket. Bergil hema pihinek li pêş çavê rovi da, ew li erde direj kir. Hema roviye di baz da û dûr ket û got: Wele bira mi dizani bû tu ne şer i, lê te xwe li ber çavên min dikire şer. Min ji bi hèviya çenik goşt digot belê.

\*\*\* STRANA KURDMANCI:

### CETELÊ AÇÊ

De lo lo lo lo .....  
 Hekîmo w'ez bi qurban ji dirziya  
 Birîna bavê Mistê mede ber kelan û derziya  
 Bira kwîr bi caxê mixsî Mûradê malek şewîti  
 Qûft merhemê xwe hilanî ji ber birfna bavê [ Mistê de reviya  
 De rabe siwaro, par n xweşo, sala îsal [ birfndaro  
 Ji mi dixwaze tasek av, ji belekê herfê, ji ka- [ niya Sîmo  
 Zozan bisewite pir f saro  
 Hekîmo ji Helebê ji Hemayê  
 Birîna bavê Mistê xedar e, derman lê nayê  
 Ji fêza hetanî fêza  
 Birek malê me danfne zozanê jorf va bi réza  
 Bira ne Ferho be, ne zozan be, ne Silêv, ne [ Batiman be  
 Birfna bavê Mistê xedar e, dixwaze pelê pel- [ hewesê  
 Hey lê wayê... birfna bavê Mistê xedar e, ji [ mi dixwaze dermanê vê dinyayê.

# JI HONKONGÊ

## HETA BI NÜYORKÊ

**Herwekti xwendevanê** me dizanin Honkong li rohelatê Çtnê giravek e. Ev girav mistemlike û di Pestifîkê de wargeheki stola ingilzî ye. Par japonan Honkong vegirt û herwekti adet e rajer yani tebeyen dewletên dijmiin, ên tê de, girtin. Di nav girtiyen de yekî emêrîkanî bi navê Jan Henrik Marsman hebû. Marsman xwe ji nav lepên japonan xelas kir û ji Honkongê revi. Marsman biserhatiya xwe di rojnama ingilzî Saturday Evening Post de belav kiriye û gotiye:

Em hemî kiri bûn xestexanekekê. Di nav me de rajêrén her dewletê hebûn. Di rojén pêşin de heçti buyant, tev de girti bûn. Fermandariya japoni emir da ko herçî talyan, eleman, Iswêcî, portigali û xelkên giravên Filipinê ne, serbest bihilin. Li ser pesteparta min moreke Filipinê hebû. Min ji xwe re got, ezê carekê siûda xwe biceriblinim. Min da xwe û ez çâm cem zabitê japoni, yê ko peya ji hev dibijartîn û hin serbest dihiştin.

Zabit gote min, tu ji xelkê kû derê yi?

Min lê vegerand û got, ez filipînti me, ji kerema xwe fedkire mora pesteportê.

Zabit: Tu li kû ji diya xwe bûyi?

Min: Li Holendê, di Amsterdamê de

Zabit carekê den li pesteportê fedkiri, da eqîlê xwe, qey liştê ko min got serê wi girti bû. Paşê gote min:

— Holende serê me dike, divêt tu herf Stanleyê (qerargeha hêşiran)

Min: Ez li te ecêbmayî diminim. Şevedin kumandar gote min, ji ber ko ez filipînti me divêt ez serbest bême berdan. Tu dixwazi min bişîn Stanleyê

Dawl, min zabit qani kir. Hinek madê xwe kir lê westqak da destê min û got: Tiwê di nav bajér de serbest bigert, lê di bin nezaretê de yi.

Piştî saeteke min xwe gihande jinikekê ya ko di mala xwe de ode kirê dikirin. Jinikê odak da min ji. Ez tê de cih bûm û li hevalên xwe ên çînî geriyam. Hevalên min ji min re ciline çînî peyda kirin. Min hero ew cil li xwe dikirin û ez dixebeitim xwe hinj wê girêdanê bikim û tê de wek çîniki xuya bikim.

Bi vi awayî ez gihaştîm gê Sibatê. Min dizant bû ko heta çend rojan japonian di heqê me de qerareti qeti dê bidana û bîve nevê ez ji ezê vege riyma hêşrigahê. Ji aliye din sersala

çînîyan ntzing dioû. Di rojén cejinê de çînî ji cejinên xwe pêve bi tu tiştî mijûl nabin. Ji lewre diviya bû ez xwe bilezinim û rojkê berl rojkê bi rê bikevim.

Siûdê arkariya min kir. Ez rasti çîniki welatjori hatim. Camêr rabû ji min re 25000 dolar ji dan da ko hi rê ve arkariya niđevanan bikim. Min kir ne kir mérîk ji min senedek ji ne stand. Jê pêve mérîk gote min: « Tu xatircem be, ezê braziyê xwe bi te re rékim; ewê te bigehîne selametê ».

Brazi ji wek mamê xwe camêr xuya dikir. Brazi plana reva me ji min re da zantn. Emê ji bajér di rêke welê re derketana ko ji çînî û japoniyan pêve ji herkesi re bend bû. Biyanîyê ko li ser wê riyê bîhata ditin bi cezayê kustînê wê bîhata ceza kîrin.

Li 10 Sibatê saet heşt û nîvan de brazi hate cem min. Min cilên xwe ên çînî li xwe kiri bûn. Rêberê min brazi — ez wt holê bi rav dikim — li cilên min temasâ kir; ew hinek edilandin, bewraniyê min li min şîdand û



Ji ber bégaviyên şer hikmetê di Ingiltere de balavxaneyên herdayî çekirine. Kebanî kincêñ xelkê xwe dibin wan balavxanan û tê de dison.

em bi rē ketin. Bi timobileke postē em gihaştin derveyt bajér û li wir em ji timobêlê peya bûn.

Qey rojekê zewê bû. Xelk li hev giha bûn hev û têcîrine çinti hûr-mûr difirotin. Em ketin nav xelkê û me li hûr-mûrên têcîran temaşa dikir. Caré ko em di ber nobetdarén japoni re derbas dibûn me xwe xwar dikir û silav li wan dikirin.

Piştî saetekê em ji qerebalişê ji xelas bûn û derketin çolê. Me da riya çiyaki. Min dikir ez ji şahiyêbihina xwe bidim. Lê dengê motorekê kir, ko ez bihina xwe di xwe de bigirim. Kemyoneke eskeri da bû pey me. Me nizant bû em çi bikin. Li milê rastê gornistanek hebû. Me xwe bavêta gornistanê û me xwe di nav tirban de vesarta an me di rêveçûnê de dom bikira. Brazi qerara xwe da bû. Me xwe tev ne da; kemyon di rex me re borti. Em xelas bû bûn. No, min disan xwe lezandi bû. Kemyon ji nişkekê ve sekini. Me nema dikari bû lingén xwe ji ber xwe havêta; çongen me şikesti bûn.

Em geleki hêdî diciûn, lê disan me nizingli kemyonê dikir. Rexma seqemê me xwêh dida. Ëdt japoniya li me dinihertin; niho wê dest daniyana ser me. Ji nişkekê ve motora kemyonê sîxûlî û kemyon ji ber çavên me winda bû. Me bihina xwe da.

Piştî sih kilomêtiri em rasti kûlikî (emeleyen hindî an çînîyen ko li cem ewropayiyan dixebeitin) hatin. Piştî ko brazi pê re da û stand, me zanî ko mèrik xwe di qelafeta kûliyan de vesartiye.

Kûli da pêsiya me û di şiverékê re berê me da çiyê. Piştî çend kilomêtiran em gihaştine avahiya dibistanekê. Ji bén pêve her derên avahiye xirab bû bûn. Brazi ji 25000 dolarên me hin pere dan wî kûliylî.

Li hire em rasti Dr. King hatin. Dr. King piştî ko di Honkongê de xebiti û ji yîna hezaran esker xelas kiri bû, keti bû desten japonan. Lé ewi jî wek min reyek peyda kiri bû û baz da bû. Ürisekî jî xwe gîhandi bû me. Min navê Sérj li áris kiri bû. Bi vi awayî digel hevalen me ên çint em bû bûn şes peya.

..

Piştî roave rêberê me, em bi rê xistin û ji nû ve me da pala çiyaki. Piştî ko em li wî çiyayı qelibin; daktekin perê behirê; delaveki, wek benderekî. Tê de çend filûqeyîn mastvanan xuya dikirin Heta kubariya sibê em li qeraxa behirê man. Bi sefeqê ve rêberen me em birin û em xistin enbara filûqekê.

4

204



Medeniyeta alestan çigas pêş ve here ji destxetên kevin qimeta xwe winda nakin. Herweki di klîşa jorin de tête ditin xortine ingilizi yên ko di tersaneyên Ingiltere de dixebeitin, bi rewjokan hewdê filûqekê dikolin.

Filûqekê teng û revîn. Ji me re gotin bi roj qet melivin û bi tu avayı xwe şanî medin.

Balafrîn japoni di ser benderê re difirîyan. Motorhoten wan di benderê de diciûn û dihatin. Her kari bûn ntzingiyê li me bikin û me bibiliun. Lé ne dikirin; ji ber ko filûqa me vala dihesibandin. Cihê me ewçend teng bû ko heke yekî xwe tev bi daya, diviya bû em ji wek wî bikin û xwe tev bidin da ko bi hev nekevin.

Mirin ji wî hatt çêtir bû. Me ne dizant deryavanen me çûne kû û ewê kengê vegeerin. Dinya bû bû nvro. Me li qeraxê dûyek dit. Me di dilê xwe de digot ev deryavanen me ne; taştiya xwe dixwin. Niho ewê bén û emê bi rê bikevin. Heyhat, dû winda bû lê deryavanen me xuya ne kirin.

Saet bû car. Disan dûyekî xuya kir. Dilêne ji nû ve bi imidê hiltavêtin. Lê tukesi xuya ne kir. Bû évar, deryevanekeji me reheroşek riz anf. Me digot, piştî şîvê emê Ëdt bi rê

bikevin. Me kir ne kir deryavén devé xwe venekir ù li pirsiyariyén me venegerand.

Li me bù şev. Di vî cihê teng de ma kê dikarf çavén xwe bigire ù di xew re here. Bi vî awayf û di ezabekf gîran de me xwe gihande 12ê Sibatê. Evarê beriya hingûrê jin û zarowén çînf yén ko ji gundekf nfzing revi bûn dihatin qeraxa behirê ù didan ber qîran. Ji me re dan zanfn ko ev xelk ji gundê xwe revi bûn. Ji ber ko japon keti bûn-ê. Brazf zor da xwediye fîlûqê, mérîk çû heta bejê, vege riya û ihmalkarane gote me:

— Japoni têne....

Me tev de da ber qîran û got: Zû lenger rakin... divêt em herin....

Lê befêde. Serekê nijdan goti bû ko ne wextê birêketiné ye. Ma ji xwe ci qewimf bû; japonf keti bûn gundekf, ji me bi se klomêtiran dûr. Lê heçf gundiyyen ko ji gundê xwe revi bûn, diketin fîlûqan û ji benderê derdiketin. Me li wan temaşa dikir.

Reşâhiya şevê li me daketî bû. Çend nijde bi tifing û bombe à mîtralyozê çekirf hatin û li fîlûqa me siwar bûn. Lenger rakinrû fîlûqa me a bimotor xwe tev da. Di vê demê de motorbotekê japonf ji deveyf benderê xuya kir û xwe li me girt. Li ser vê yekê kaptand me fîlûq me gihande cihekf nependî û li wê derê sekinf. Lê motorbotê ne da pey me. Roj li me hilat. Me sêzdehê Sibatê ji di wî cihê teng de derbas kir. Lê hal di me de ne ma bû. Em li mîhaflîzén xwe rabûn û daketin bejê. Wê şevê me hinek bîhina xwe da. Sibetirê sersala çñiyan bû.

Brazf bi deryavan an re kete cedelege no. Lê dawiyê zora deryavan an bir û bi nîvê şevê ve em bi rê ketin. Ji nîskekê ve behir rabû û fîlûqa me di nav pêlén behirê de wek qalikê gwîzkekê radibû û dadihat. Kaptan digot, di vê fûrtinê de em nikarin herin. Mérîk hej gotina xwe ne qedandi bû ko deryavan an lenger avêt. Pêlén behirê em aveti bûn cihekf tenik; fîlûqa me keti bû ser keviran. Em tev de daketin

behirê û heta navtengê noqf avê bûn. Me dehif da fîlûqê û me ew ji keviran xelas kir. Ji şermê ava behirê li me dicemid; qey derzî di 'cane' me ra dikirin. Di vî half de em ve geriyan kuna xwe û wek çêntine qeliyê [bi hev zeliqfn.

14ê Sibatê, şerî sibehê, di saet pêncan de min nema dikarî.

Min xwe avête bextê brazf û jê lava kir ko ji me re tevdirekê biblîne da ko em bi rê kevin. Axir me kapitan bertfî kir û bi roj em heyirfn. Lê vê carê mijike ker û gîran li me dakteli bû. Me dengê motorboten japonf yén ko diñfzingf me re diborfn, dikirin lê wan em ne diditîn. Ji ber ko mijê em nixumandî bûn. Me berê xwe da bû riya xelas û felatê.

Gava em gihaştin wî milî avê me xwe li erdê dirêj kir û me bîhina xwe da. Te digot qey em ji nû ve hati bûn dînyayê. Erdê ko em lê bûn bi xirbeyan dorgirtî bû. Çînf û japonian di van derau de li hev xisti bûn. Hej nû me bala xwe dida ko rihen me dirêj bû bûn û em di gemarê de fetisî bûn. Ev hemi ne ewçend bi ehemiyet bûn. Lê min didit ko ez bi zintariyê keti bûm.

Pişfî çend saetan em bi rê ketin. Car caran em rasî çetan dihatin, çeteyen ko şerî japonan dikir. Brazf nfizingf li serekê wan dikir û pelekî sed dolari dixiste destê wan û



GUNDIYÊN İNGILTÉRÉ ZADÉN XWE TÎNJN BËNDERË

em li wan dadiborfn.  
 Şekeké em gihaştine  
 gundekî nivxirabe. Çend  
 gundi lê vege riya bûn  
 û sôv radikirin. Yekî  
 ji wan dermanek da  
 min û pê zintariya min  
 hinek çebû. Lê sibetirê  
 gava me da bû ser  
 bazdonekekê ez şemtitim  
 û lingekî min xeliha.  
 Gozika peyê min weri-  
 mi. Dr. King digote  
 min, qet mesekine hema  
 bimeşe. Min ji welê  
 dikir û gava em dise-  
 kinfn Dr. lingê min miz  
 dida. Em héj bi temamî  
 ne gihaştı bûn selametê.  
 Ji ber ésa lingê xwe ez  
 hédf diçûm û min meşa  
 hevalên xwe jî kêm  
 dikir.

Rojekê em li qera-  
 xa çemekf rûnişf bûn.  
 Me dît kelekeke çînî digel du peyan xwe hil-  
 pesarte qeraxê. Em û kelvansî em li hev hatin  
 û em derbasf kelekê bûn. Sê roj û nîvan em di  
 kelekê de gün. Keleka me li saetê 3 kilomêtiran  
 diçû. Bi ré ve Dr. lingê min derman dikir.  
 Şekeké em gihaştine xansîf nehilweisayif  
 û weke xwe ava. Xwediye xénf bi pere em  
 hewandin û nan jî da me. Qederê çar saetan  
 em di wî xaniyê de man. Ewgend em sist bû bûn  
 ko canen me ji rahetiye qey diheliyan. Sérj yê  
 ko ji me hemiyan çétir li ber ês û ezêb dise-  
 kinf, derketi bû derive. Gava vege riya, rûyê wî  
 dikeni. Sérj ji me re filûqeke bi motor peyda  
 kiri bû.

Ji nû ve em li ser rûyê avê de diçûn. Lê  
 serê du saetan carekê motora me disekinti û  
 diviya bû bihatâ tamî kirin. Ji lwre rojê  
 ji 30 kilomêtiri bêtir me nikarf bû em pês ve  
 herin. Bi peyari me dikarf bû rojê em 40  
 kilomêtiri bi ré ve herin. Ji ber vê yekê meterka  
 filûqê da û dest bi rêvçuna peyarf kir. Herçend  
 me nîzingf li armanca xwe dikir, ewçend lin-  
 gën me sivik dibûn. Edî em bi diyari bajaran  
 keti bûn. Bajaren ko di bin hikimé ordiwa  
 çînf de bûn.

Di yekê di wan bajaran de, li ber deriyê  
 xwarinxanekê de, min dît yek banf min dike.  
 Gava ez lê zivirim, min di wî mirov de dos-  
 tekf kevin nas kir. Yekî çînf bû, keti bû  
 qelafeta kûliyan Li Emîrekê di üniversta-



ŞAGIRTËN « BIRKBECK COLLEGE » DI DERSXANË DE

Harwardé de xwendî bû. Min jê re Sûng digot.  
 Sûng yekî bankér bû. Sûng bi derbeke wele  
 xurt li pole min da ko hindik ma ez ji bîr  
 ve biçim û bikevim erdê. Sûng pere dane  
 min û her texlit xwarin û vewxwarin ji min  
 re anfn. Pişf xwariné Sûng gote min ko sibe  
 kemyonek wê biçîwa stasyoneke röhésina  
 Çonkingê. Ü herçend kemyon tiji biwa ji dikarf  
 bû te de cibekf min peyda bike. Rêwingiyên  
 kemyonê tev de peyayên wî bûn. Wan ji xwe  
 kiri bû qelafeta kûliyan.

Min ne dixwest ez ji hevalên xwe vegetim.  
 Lé min dixwest edf ji pérîsanîyê xelas bibim.  
 Sibetirê em li kemyoné siwar bûn. Dîsan ez  
 ketim cihekf teng. Di nav sendûq û hûrmûren  
 din de ez dipelixfm. Em hildikîşyan çiyan;  
 dadiketin newalan; di nav berfê re derbas  
 dibûn, diçûn.


Pişf du rojan kemyona me gihaştë stasyona  
 röhésinê. Berf her kesf min xwe jê zer kir.  
 Pişf sê rojan ez gihaştı bûm medeniyetê,  
 bajarekf welê ko mirov jê dikarf bû li balafiran  
 siwar bibe.

Di balafirgeha Nûyorkê de jin û zarowen  
 min li héviya min bûn. Min dida eqilê xwe û  
 ez lê ecébmayî dimam: Belê riya Çonking û  
 Nûyorkê ji reya Honkong-Çonking kurtir bû».


Eve biserhatiya rojnamevanakî emîrlkanî.

Amedî: 4 Kanûna-paşn 1943

SILEMANE FERHO



TERSANEYËN EMÈRİKANÌ JI PÈŞIYA VÊ SALE VE HERO SÊ VAPORAN DADIXIN BEHIRE



TANGINE EMÈRİKANÌ DI HEWSA FABRİKË DE. PIŞTİ KO MIHENDİSAN EW SEH KIRIN Ü CERIBANDIN EV TENGEN HA BI VAPORAN DÉ BÈNE RÉKIRIN QADINE ŞER EN DUR

# MEHKEMA HAWARÊ

## Ü DEYINDARE ŞERMENDE

Di bîst û çarê Çiriya paşin de, şeva Çarsenbê pişîf eşayê min dest avête kovara Hawarê û çend rûpelên wê bi kêt û eşiq xwendin. Ta ko saet bû çarê erebf û Hawar welê li ser sînga min û ez razeham.

Dor nîvê sevê, ez di xeweke sérin de bûm. Min dit ko du canbêzar bi kincén sidansî û şesagirê her yekî ji wan di ber tilê wan de û singo bi serê tivingan li ber min sekînîn. Yekî ji wan kaxezekî sor ji qewlikê xwe derxist û got, kerem ke seydayê Namî, û da destê min.

Dema min kaxezâ sor dit ji nişkê ve dilê min riciffi û xwêhdan ji eniya min dilop dilop niqutî erdê. Lewra min dizanî bû ko kaxezên sor nişanê gunehkariyê ne. Belê ji neçarı min dest avêt-û lê nihert. Berf her tiştî çavê min kete ser hinek tipên gir.

## HAWAR MEHKEMA LIHEVHATINÉ

Dawedar: Hawar Deyindar: Ehmed Namî

Ji vir pêve min da û ne da min nema kari bû bi xwendina wê ve herim. Ji tırsan her du cavêن min tarî bûn û ava germ bi kabokên min de hat. Wek miriyê nû, serê wf li leheda kevê.

Min zanf ko gunehê min deyindariya Hawarê ye û bê goman ketim pêsiya her du canbêzaran. Bi zêvûrî û perişanî wan ez birim pêşberê hikimdarê mehkema Hawarê. Lî ji şermizariya xwe her serê min tewandî bû. Min dî ji nava civatê dengek hat:

— Namî ev mehkeme ne bes ji bo te çebûye. Belki ji te û xérî te re, kesê dibêjê ez kurd im û deyindar maye. Tenê hatina te fro dîsa bi camêrî û serfirazî ye; serê xwe bilind ke. Mehkema Hawarê fro mehkema lihevehatinê ye. Belê, rojek wê bê ko ji sedî not mirov bi xweşl ji ve mehkemê dernekevin. Paşê wê mirinê ji bixwazin û mirin bi destê wan nakeve. Lî ji ber ko te xwe nas kir û zanf ko deyindarê Hawar û Rohnahîyê yî û xwe dest û dawî mehkema Hawarê kir, mîzgîn ji te re, bê cewr û cefâ mehkemê tu eftî kir. Bes divê deyinê xwe û léçûyê mehkemê ji bidî.

Min deyinê xwe herdu nas dikirin. Belê léçûyê mehkemê min nizanf bû çiqas e. Paşê ji min re gotin. Xerc 200 qırûş in. Min di dilê xwe de got, eger cezayê min ev bê, nexwe ez bi tiştefkî hêsanî û hindik xilas bûm. Spas pêşkêşî Xudayê xwe kirim, zû zû deyinê xwe û xercê mehkemê ji danfn ser masa serekvan, cûme destê wf û miu got:

## GELAWÊJ

### GOVAREKİ EDEBÎ Ü SEQAFÎ MANGÎ KURDÎ YE

Çar hejmarê Gelawêjê, di du bendar de, vê peşiyê gihaştine desten me. Em rûpelên her du bendar ên pêşin yên vê kovara hêja bi tipên kurdî diguhêsinin vê stûnê:

Jimare 9 û 10. sal - 3. Eylül û Teşrinî yekem 1942

#### LEM JIMEREYE DA:

Kurdi be nav û bang	Emin Zeki beg
Dwanzde nawdarekan	Osman Ibrahim
Cexräfayî Kurdistan	Mistefa şex Nîmetîlah
Kirdeweyî lawîk	F. Hüşyar
Naleyî hejarîk	E. Çalak
Tefsiri Quran	Şex Mihemedi Xal
Diwanî Gelawêj	.
Felsefeyî cemal irfan	Nuri Mecid Selim
Mejîveyî colaneweyî	Evdisemed Mihemed
Posteyî Gelawêj	E. X.
Pê zanîni dil	Dilsûz
Le kon û qûjîni	Nejad Evdilah
Çiroki jimare	N. E.
Ferhengî Gelawêj	Tewfiq Wehbî beg

We gelî basî xoşitir exoninewe

Jimare 11 û 12. sal - 3 Teşrinî dewem û Kanûni yekem

#### LEM JIMEREYE DA:

Kurdi be nav û bang	Mehmûd Xawer
Cexräfayî Kurdistan	Mistefa Şex Nîmetîlah
Xûlyayı swiki behar	Hewri
Derd û endisîyi komel	F. Hüşyar
Tarix û esxas	Piremerd
Lapereyi tarix	Salih Qeftan
Tefsiri Quran	Şex Mihemedî Xal
Diwanî Gelawêj	.
Nameyîk	Yûnis Reuf
Sîqrat mihakeme kira	Evdilkefür Dilşad
Çiroki jimare	N. E.
Ferhengî Gelawêj	Tewfiq Wehbî beg

We gelî basî xoşitir exoninewe.

Xwedê mehkema hewe serfiraz, dûr û dirêj bîhêle li ser heqiyê.

Serekê hîkimdarân li min vegerand û got:

— Namî, binêre serbilindayî çiqas xweş û sernizmî çiqas çetin e. Di nav heval û hogiran de her du jî ji desten mirovan têne serên wan. Sed heyf û mixabin li kurê cameran ko ji bo tiştefkî hindik û nehêja serên xwe bidin ber xwe; li pêşberê heval û hogiran, nemaze merfî kurd.

Hingê min zani mirovîn comerd serbilind in û mirovîn destgirtî û bexfil her sernexwin û totak in.

Gelf birayên guhdêr, ez ji hewê hêvî dikim ji yên nebihîstf re jî dibêjîm; da weko hon ji wekî min sermîz û sernizîm nebin. Ez kurek ji kûrên Hawarê dihatim hesab kirin û min xizmetên geleki mezin jî jê re kiri bûn. Lê ji ber ko min çend hfvan deyinê xwe bi sün de da bû, evçend fêtkari hatin serê min.

Gelo lê çawa e w kesê ko ji roja ko Hawar hatiye dînyayê û Ronahî jî li pêşberê wê hatiye, hetanf fro hêj ew li xwe ne xebitîne û deyindarêن îlawar û Ronahiyê ne. Halê wan wê ci bê; halê wan xirab e. Paşê wê bikevin ber dehwa û hisaban. Digel dayfna deyinê xwe ji bi zêde bûn. Mehkeme jî wê dijwartir bê, yanf wê mehkema leşkerî bê.

Sertucandina mezintir û xwêhdana mirinê wê gavê ye. Û bizanîn ew roj jî pesberê hewe tê. Honê poşman bibin û poşmani jî bi desten we nakevê. Herwekî hatiye gotin jî pêşîya de [ bi xwe kira derman nîne ] Deyinê we fro gelek hindik e. Çığa bi sün kevê hewqas giran û mezintir dibê û mirinê bi xwedîyê xwe xwes dikê.

Eyf guhdêrén delal û xwendevanên serbilind, hevqas zehmetiyen ko hatine serê min giş di xwêdê bûn. Gelo ko ew ne xewin bûya wî çiqas dijwar û çetin bûya. Pişti ko şiyar bûm min

nêri kocilê min ji xwêhdanê bûne av û leht,

Ma çire em bi destê xwe, xwe tavêjin tehlükê. Xudayê mezin di quranê de getiye  
وَلَا تَنْهَا بِأَيْدِيكُمْ إِلَى الْهُدَىٰ

Kurdêñ héja em tev birayê hev in ez zirara hewe naxwazim. Bi Tenê ez qençî û serîraziya we dixwazim û min navê tiliya yekf ji we hilpekê, biçûk û mezin. Lê dixwazim hon ji benda comerdan bêne hesêb kirin. Ne ji benda bexilan. Çîko Xudayê gewre di quranê de tein daye bexilan û gotiye  
وَلَا تَحْمِلْ دُولَكَ مَقْلُولاً إِلَى هَنْقَلٍ وَلَا تَبْسُطْهَا كَلِ الْبَطْ

فَتَنَمَّدْ مَلَوْمًا حَسْرَوْا

Comerd nêzîkî Xwedê ye, nêzîkî xelkê ye û nêzîkî cinetê ye. Heçî merikî bexfl e weke kerê ko barê wî zîv û zîr bê û xwarina wî ka bê. Hem ji dûri Xwedê ye, dûrf xelkê ye û dûrf cinetê ye.

Gelo ji van her diwan kfjan xweştir e.

Ez hêvîdar im ji Yezdanê mezin ko kesekî ermizar û bê imîd nekê.

Her bijn comerd, her bijn arikarenê Hawarê, her bijn xort, her bijn Kurd û kurdistan, her bijn mehkema Hawarê.

EHMED NAMÍ



DI SER CENKEŞTÎKE INGILİZİ DE BATARIYÊN TOPÊN BALAFIRSIKEN

# MELA ENWER

Mela Enwer li sala 1913an li heyva Adaré di gundê Mayê de hatiye dinê. Maye nizingî Amêdiyê ye. Enwer ji eşîra Berwari joriye. Navê bavê wî Şex Mihemed Tahir e. Bavê wî yek ji zanayên demê xwe bû. Navê wî bi zanînê û teqwa diyanetê belay bû bû hemi Kurdistanê. Esilê mala Mela Enwer ji pêş ve, ji mirên Mukriyan e.

Enwert li Amêdiyê li ber destê mistiyê Amêdiyê Mihemed Şikri esfendî dest bi xwendinê kiriye. Enweri sê salan ji li Dihok, Zaxo û Hevlê dersêni serîeti xwendine. Lî dawîya zanfna xwe li Amêdiyê tawaw kir û li sala 1936an ji seydayê xwe Mihemed Şikri icaza dwanzde wergirt.

Mela Enwer qedere du salan li Zibarê di gundê Şêrwanê de bû mamoste. Paşê wî dest jê berda, li gundê xwe rûnişt û şret li xelkê eşîra xwe kirin.

## MIN NIZANI BÜ KO RIHISTIN JÎ DIJMINÊ KURD E

Berê, ez li gundan kurdeki cotkari bûm. Lî ev pênc sal in, ez hatime Amûdê û bi işe ticaretê mijâl dibim. Min xwendin û nivisandina kurdî ji nizani dû. Hişyar, mala Xwedê û ya wi ava, ez hînt nivisandina zimanê xwe kirim. Ji hingê ve hêtir evîna welêt li min dijwar bû û liber civatê ez bûme dozkar.

Lî tevayiya şex û melan bûn neyarê min. Wek hevalen din ez ji guri bûm. Bi vê guri-bûna evinê disa dilges û bextiyar dibûm.

Di vê navê de û ji bo ticaretê ez cûm Hetebê.

Lawikê min tî dusalt hebû Gava ez vege riyan mal min dit ko lawikê min emirê Xwedê kiriye. Wextê ji min re gotin

lawê te, tu xweş. Min got: Bîla Kurdistan sax be.

Birayê min i sofi, zavayê min i mela ye. Her du hatin û gotin min:

— Tu dibini tu bûyi kurd, te hevaliya xorten kurd, kurdên welatparêz kir. Tu bûyi xwenda. Te kovar û rojname xwendin. Te bêdiliya şex û melan kir. Ji lewre lawê te mir.

Edî sebira min ne ma bû. Ez xeyidim û min li wan vege rand û got:

— Malxirabino! ma rihiştin an Xwedê ji şex û mela ne. Ma bi tenê kurd dimirin. Mirin tiştekî tevâiyê ye. Qey rihiştin ji romî ye û bûye neyarê me. Ax ji derdê mirovên bêçav û bêguh.

ÜSIF HECİHERSAN

Bi rasti Mela di nav berwariyan de ji bo xwendin û mîvisandinê xebateke çak dike. Mela Enwer melaki nûgeh e, bi fikir û hîzren xwe.

Par li wextê tatilê ez cûm gundê Mela Enwer. Ez bi wê çûyinê gelek dîlges bûm. Sîh xorten kurd li dora melê civiya bûn. Mela li ser depê reg ji wan re dersen kurdî dida; bi tipen kurdî ën nû.

Min got melê: Seyda, ev tipen kurdî ën nû bi seriet catz in?

Melê li min vege rand û got: « Belê caiz in » û ji min re bi çend ayeten Quranê delîl ji anfu. Paşê disan melê got: « Ezman bi ci awayı bihîte nivisandin ew terz dirist e. Ü em diblin ko kurdî ni van tipan ji tipen erebt xweştir dihêt xwendin û seh kûrin ».

Paşê melê ji şagirden xwe re got: « Xortino ev tipen ha ji me re ewlatir in. Çunki kurdî bi tipen erebi xweş nahete xwendin. Jê pê ve mirov dikare bi van tipan hesanitir ezmaneki ewropayî fer bibe. Çunki tipen me û yên wan teşbihi hev in ».

Piştî ko dersa xwendina kurdî temam bû, melê ji şagirdan te bi ku di tesfîra Quranê û hedîsen pêxember ji dane zanîn. Di pey hedîsan re ji melê dersa serîtelê vekir û ji şagirden xwe re eqide ji bi kurdî got.

Li dawîya dersê min jît ko şex Mezher hate li nilkîne. Li destê wi de kitêba Tarixa kurd û Kurdistanê ya Emin Zeki begî hebu; ligel Hawarekê û hejmareke Ronahîye. [ Şex Mezher apê Mela Enwer e; şexeki dîn û welatperwer e ]

Şex Mezher gote min: Er-mexani, min zehf tertepelén kurdî ën dun heyn. Lî ji hemîyan pêtir ez hej Tarixa Emin Zeki dikim. Ewi ji bo miletê kurdî kareki çak pêk ant. Ev cara didowan e ko ez vê tertepelê dixwinim.

Hercî tîpêni, Xwedê giyanê neviyên Bedir-Xan begî xweş bike. Min zehf hej xebata wan a nû kiriye, zêdebar bi tefsîra Quranê bi kurdî. Ev tefsîr hêjyat gelekti ye ji bo miletê kuref. Xudê heye ji

## WA MILETÊ KURDİ

Pêş kevin em, serfiraz in miletê kurdi  
Yan mirin dê bibinin yan jina kurdî  
Wa miletê kurdî.

Bi xwendevan, xwendegahan, bi al û leşker  
Dê bijin, paşê dikarin rêcê bibin ser.  
Wa miletê kurdî.

Heta kengê em biminin bin destê dijim  
Geh bi kuştin, geh bi sotin, tim tê bira min.  
Wa miletê kurdî.

Kurdistan êdi menale, lawên te hatin  
Xwendevan in, xwîn-froşen axa welat in.  
Wa miletê kurdî.

Mal, can û dil bi carek bo te fida kim  
Xwinê xwe ên paqij dirêjin bendeyê nakin.  
Wa miletê kurdî.

Ala rengin bo te dayinin ger ser bi der din  
Ger nekim vê tu bizanê ki ez ne kurd im.  
Wa miletê kurdî.

EHMED NAMİ

feqî û şagirdên me re fehimkirina Quranê bi  
vê tefsirê wê gelek hêsanf bit. Ez gelek ilhahê  
dikim ko feqî zû fêrî van tipen nû bibin  
da ko bikarin di hejmarê Hawarê de, yên ko  
ji min re dihêن, tefsira Quranê xweş bixwinin».

Min ji şex re got: Şexê min tu çawan holê  
xweş fêrî van tipan büyf?

Şex li min vegerand û got: Ermeşanî,  
Xudê heye ez di nav du heyvan de fêr bûmê.  
Nîho ez dikaram baş Hawarê bixwînim. Xude  
emirê Mela Enwer dirêj bike. Ewi gelek zeh-  
met bi min re bir. Xudê anehê bidet, ev tip  
di nav kurdan de belav bibin da ko kurd  
bikarin bi ezmanê xwe biniyîsin û bixwinin.

Ez ji gundê Mela Enwer bi dilekî ges  
vegeriyam. Ev rûha nû ya ko di nav kurdan  
de belav dibe. Şexen me ên 50 salî ji hinif  
tipen kurdî dibin. Min zehf spas li Mela  
Enwer kirin. Ji milê din min gelek tertepelén  
kurdî bi tipen kurdî pêşkêşî xorîn wî kirin û  
ez vegeriyam. Amediyê.

- Tistên ko Mela Enwer heta niho nivisine ev in:
- 1 — Diyarîya lawan. Pend û şfret li ser  
jiyîna civakî û welatparêziyê
  - 2 — Kitêba Gergorî, bi navê « Leylanka  
spl » wergerande kurdîyê
  - 3 — Mewlûdeke kurdî, menzûm
  - 4 — Tertepelike baweriyê, menzûm
  - 5 — Tertepelike metelûkên kurdî, qedere  
2000 metelûk tê de hene
  - 6 — Dîwana Mela Enwer. Şîhirîn welatin,  
heyran û wesîf

## SERBESTÎ

Divêtin em li vê rêkê nexwazin nav û serdarî  
J'dil û fman xebatê b'ken bi rastî cm bikeyn karf  
Divêtin em heuni pékve li xwe b'zivirin bikeyn tobê  
Zîki paqij bikeyn j'kinê devî taze bikeyn j'parî  
Şev û rojan bikeyn solî ji bo serbestiya kurdan  
Qemi em xo bîkêşin tev j'dev û lêvén evi mari  
Hemî em sed hezar xûh û hezar xûnan vemalîn j'xwe  
Li nav séraziya diya j' me naçit ber perê tarî  
Bi xûh û xûn û kiryarfî digin armancîha zérin  
Tu pavê nermîyê bigre, bi herdu destâ dijwarî  
Kesê l'héviya helatna roj bibit divê mikun bit l'ser  
Giranî tehîyîn sev da heta sibhê ji évarî  
Pere em ji bi serbesti bi xoybonî bijin herdem  
Bikêşin der ji van tirban ji xwe bavêv evi barî  
Çi xoşî hûn dibêniñ ma li vê jina bi sergûri  
Geda bi ya xwe paşî bi tu yariya xwe xundikari  
Çi tamê seh dikin an ji jî vê jina bi zindansî  
Şivan bi ya xwe gavan bi tu rüti ya xwe maldarı  
L'biheşte ger ko serbesti ne bit ya cak bihêli wê  
Bi qasvûri ne ji cenda serê te pê bikin yarı  
Heçî saxiye ya li bin siha şîr û metalan da  
Heta destâ bi xûnê ter nekey naji bi serbarî  
Belê ger dest nivêjê b'şoy bi xûna cerg û mîlakan  
Tu de jî paşê hîngê jineke taze bi næzdari  
Li rêka jîn bi xoybûni hene zor biş û zor asteng  
Piling û şer divêt canî bikeyn gorî bi yekcarî  
Çelengî zireki çakî hebitin an nebîtin te  
Çi fayde jê girênadey eger kiryar neçit harf  
Ji tirsê jaijî qed'bîtin li kîrnê xoşî û nav e  
Divêt em sed hezar cana tilêfin da biçin şarî  
Hemî kurd xûnek û goşt in Kherîya ka xwe Bidîşî  
Ciziri ya xwe Babanî çi Badînî çi Berwari  
Çi Lori bit çi Feyli bit çi Pijder bit çi Dersim bit  
Çi Caf û Hewrenanî bin Bilûx bin ya xwe Şengari  
Hemî şer in bi rastî ki weki wan ma heyâ ev ro?  
Ew in sertûrka insanen ji Moşol Samî û Ari  
Divêtin em mikun bin her heta dighêne armancê  
Çi saet me nebîtin hiç hemî gava bi hisşarı  
Gelek şerm e gelî lawan bîhêlin vî cihê rengin  
Ji destê te'siba û em bibin hê behr ji vi warî  
Erê lawê çiyani em hemî pek ve li vê rêkê  
Dê gori keyn ser û mafî nizanî em çep û xari.  
Amîdiyê MELA ENWER

Mela Enwer legeba xwe daniye Lawê Çiya.  
Vê pasiyê Mela Enwer ji min re karteke cejinê  
şandi bû û té de goti bû:  
Hon biken cejinê bi pîrûz hemî gav û dema  
Her bi serbesti û xoşî şahi û këf û sema  
Min ji lê vegerand û got:  
Cejîna me pîrûz bit bi dilekî şad  
Welalê me berz bit qewmê me azad  
Xudê emsalen mela Enwer ji bo' pêşveçûna  
kurdîtiyê zêde biket.

M. ERMEŞANÎ

# MIL Ü ZIL

## BIR Ü ESASÊN EŞİRËN KURDAN

Di hejmara Hawarê a 52an de du bend hene: Gawestiyayı û koçerên kurdan Qedri Cemil paşa Mirdesan û gawestiyen wan Osman Sebri

Di van bendan de xwediyan li mesela gawestiyen hûr bûne û esasê vê gotinê xistine ber ronahiyê. Herçi axayê mirdesan, jê pêve çiroka eşira xwe, nemaze ji awirê gawestiyen ve, bi ser û berê wê ve gotiye û rüpeleki tarixa eşirên kurdan ji winda-bûnê parastiye.

Herweki ji wan bendan ji dixuye, li wextê koçeriyê û dema ko kurdan barêna xwe li gan [1] dikirin, hin esir, gava dicün zozan an jê vedigeriyan, ji ber ko gayén hinan diwestiyan, ew eşir bi xwe ji hev vediqetin û bire bişûndemayı di cih de dima, nema yedigeriya welatê xwe û ji xwe re wareki nû dibijart. Ji wi birî re gawesti digotin.

Pistre, ev gotin ji hemi birêna eşirên re, yên ko bi sebebîne din ji ji koka xwe vediqetiyen, bû elem. Yanî ew bir ji bi vi navî hatine bi nav kirin.

Li wextê berê gava eşir ji hev de diketin ne bi tenê di ciheki de bi sün de diman. Lê

[1] Hetani fro li Serhedian û di nav eşirên Ecemintanê de kurdan hene ko barêna xwe li ga gamêsan dikin.

carina di yeki bêtir waran de bi cih dibûn; wek eşira berazan.

Iro di sê derên Kurdistanê de beraz hene: Dêsta Sirucê, Serhedian û Welatê ecem. Edî em nizanin ev birêna ha di yek seferê de an bi seferine gelêr [ miteedid ] û têvel [ mixtelif ] de hatine pê.

Ji milê din birêna bişûndenayi li gora boşiyê, carina bi navê xwe eşireke bi ser xwe tanîn pê, carina ji navê xwe hiltanên lê dibûn qibileke eşira ko li warê wê datanin.

Bivê nevê, ên bişûndemayı heke bi tenê ji cend konan bi hev diketin, xelkê wan konan di nav eşira xwediya war de winda dibûn.

Li gora misala azizan, carina wan cend peya bi serbendeki héja malbateke hikimdariyê ji tanin pê û dibûn hakimê welat an eşirekê.

Tiştê ko ez dizanim, azizan di sê derên Kurdistanê de têne ditin: Serhedian, Beriya Mêrdinê û welatê Botan.

Azizan bi ser Heyderan ve dihesibinin. Lê bi xwe eşireke boş e û wareki wê i xweser heye û jê re welatê azizan dibéjin Herweki li welatê Serhedian ji komeke golan re ji golên azizn tête gotin.

Aziziyen Beriya Mêrdinê qebileke kikan in û bi xwe dibéjin ko ji eşirên gawestiyayı ne. Welê dixuye ko ew aziziyen ha gava ji eşira xwe vegetiyan nikari bûn eşreke bi ser xwe



BALAFIRÊN BEHRI ÊN İNGİLİZİ DI HEFADIYA PERAVÊN İNGİLÎSTANÊ DE



PIYADEYÊN BRITANÎ DI QADA TÙNISÊ DE PIŞTÎ BOMBARANA TOPÇIYAN RADIBIN HICUMË  
bînin pê, xwe dane ser kîkan û bûne qebîlak  
wê esîrê.

Di dora kîkan de esîrê din jî hene ko seden wan digehin se lén 'ikan. Gelo van azîziyên ha qîre kî-an di ser esîrê din re jîrtine  
û rajêriya wan kirine? Heye ko ji ber sebeba  
mil û zil. Bi rastî kîkan ji wek azîzan siliv in.

Herçî azîziyên cihê Botan, ew ji gawestiyâ  
yayen ezîziyên serhedan in. Lê wan di cihê  
Botan de ne eşfrek anîye pê û ne ji  
qebila eşfreke jî otan. Azîziyên cihê Botan mîrê  
Botan bi xwe ne.

Herçend di destên me de tu wesiyejen  
tarxî nîn bin ji, em dikarin bi rîzîkên koçerîya  
kurdmancan ve herin, bidin ser sopa  
azîziyên Botan û texminin li ser bikin.

Li destâ Misarê û li tixhîbê jêliyan ciyayek  
heye, jê re Banê-Azîzan dibêjin. Heta vê paşî  
yê ev çiya koza dudêran bû. Ev ciyayê ko  
navê azîzan hildigire divêt bi navê azîziyên  
gawestî hati be bi nav kirin.

Li gora vê texminê, li wextê berê gava  
esfra azîzan di nav Kurdistanê de digeriya û  
pişti ko konen xwe li beriya Mêrdin û destâ  
Hesinan vegertiye reya xwe bi destâ Misarê ji  
xistiye [1]. Li destê gayen hinan westiyane. Ên  
gawestî li vê destê mane û paşê hilkişiyane  
ciyayê rex û ew çiya kirine koza xwe. Ji ber  
vê yekê navê Banê-Azîzan li wî ciyayı kirine.

Ev azîziyên ha li şûna ko bibin qebîla  
esfreke Botan çavên xwe berdane mezînahiya  
welêt û bi rîva bûne mîrê Botan. Ji xwe ji

[1] Ji xwe heta seferberiyê koçerîn Botan di  
welâtê Başqebla û Colemêrgê re diçûn heta zozanen  
Wanê û jê wê ve ji.

mîrê Botan re hetanî iro ji mîrekên Azîzan  
dibêjin [1].

Ji vê biserhatiyê dixuye ko gayen van  
azîziyân westiya bin ji bi xwe qet ne westiya  
bûn. Westiya biwan ma kengê dikarî bûn vê  
xebata zor bixebeitin û bibin mîr û hakimên  
welatekî.

Piştî ko me çavên xwe bi kurî li mesela  
gawestiyân gerand, em bêr ser mesela « mil  
û zil ».

Herweki ji her du bendê Hawarê û ji vê  
bendê dixuye eşîrê kurdan ji avirê war û  
tevdanê ve bi du biran leva dibin: Eşîrê ko li  
ser warên xwe ên kevnare mane û eşîrê ko  
di wextê koçeriyê de ji giraniya eşîrê xwe  
veqetiyane û li wareki nûjen dantîne.

Lê di nav eşîrê Kurdistanê de jê biesas-  
tir tegsimik heye. Ew ji birên Mil û Zil e.  
Mîna ko herkes pê dizane eşîrê kurdan bi  
bingehêne xwe ve vedigerin du bend û cihder-  
kan: Mil û Zil. Yanf herçî eşîrê Kurdistanê  
hene an mil an zil in. Ji zil re siliv ji  
dibêjin. Mirov ji kljan kurdî bipirse, ewê tavil  
bibêje, ez mil im, an, ez siliv im [2].

[2] Lê piştî ko mîrê Botan ê paşin Bedir-Xan  
Begê Azîzi bû hésir û miritya Botan wek mirityen  
Kurdistanê ên din qelha û mîrekên azîzan tev de  
ji welêt derxîstîn -- ji Mihemed Begê ker pêve - di  
welate xerîbiye de bernavê mire paşin Bedir-Xan  
ket şôna navê malbatê û xelkê ji mîrekên azîzan  
re Bedirxanî an Bedirxan-zade, got.

[2] Herweki nas e iro ji li Kurdistanê bi van  
navan eşîrin hene: milan, zilan, silivan. Lê em niza-  
nin esil ew in an pişte ev nav bi wan ve bûne.

Li wextê berê gava eşiran şerê hev dikirin koma şerevaniyan li ser vî esasi bi hev diketin. Heç mil di wareki de digihan hev. Zil jî li hev dicivian hev û şer dikirin. Heke di nav du eşirên mil, an zil de neyartî hebiwa ji gava şerê tevayıyê çedibû ev neyartî ji bir dikirin; milan bi milan û zilan bi zilan re hevalti dikirin.

Belê mil û zil wêlê bûn û fro ji carina guh didin vî esasi. Em tev de pê dizanin. Lê çire? Mil ci ye? Zil ci ye? Mil kî ne? Zil ki ne? Divêt ev bête eskere kirin.

Min gelek lê pîrsi. Lê tukesi ne zanf bi bersiveke maqûl li min vegertne. Divêt peyayin hebin ko pê bizaran; lê mîxabin ez rastî wan ne hatime [2].

Beri bîst û çar salan yekî — nik dilêmin yekî sindî — di vê habetê de ji min re çirokek goti bû. Ez jî dikim wê çirokê ji we re bibejim.

Di sala 1919an de ez li Zaxoyê bûm. Digel çend axayên eşirên dorê, em di civata Mihemmed axayê rehîmetî de rûnişti bûn. Min çel li işe mil û zil dikir. Piraniya civatrûniştiyan dijot: Eşirin hene mil in; eşrin hene zil in.

Kalemérêkî pişti ko da qelûna xwe û dev û dişina xwe ji dî û dûmanê tijf kir berê xwe da min û got:

— Ez ne i xwende me; min tu mekteb û medrese jî ne dtîne. Lê carekê di vê habetê de ji yekî welatjorî min çiroke bihîstiye. Ezê wê çirokê ji we re bibejîn. Tu vi çiyayî dibînf ( Cûdi şanî min dida ) wî bigire û pê ve here, heta bakurê Wanê. Ew der dawîya çiyê ye. Cihekî asê û bilind e. ( xuya dikir mexseda wî Agîrl bû ) Li serê çiyê ne însan ne heywan, tu tiştê bican nikare debar bike. Hema berf û qesa ye.

Li wextê berê di wî çiyayî de mirovek dijî, giremêrek; yekî dêwendam. Navê wî Kurd bû; Kurd bi mana mîrê qenc e. Mîrik xudan el tî eşir bû. Rojekê berfendeyek, bi qasf çiyakî li warê mîrik gér bû. Mîrik digel elâ xwe di bin berfendê de mehiw bû. Ji zar û zêçen wî du kurên wî jê xelas bûn. Ew jî di wextê afetê de dakeți bûn kûntara çiyê û li giyayin digerîyan, giyayine derman. Ma gerek e ez ji we re bibejîn ko hingê diktor û eczaxane nîn bûn.

[1] Min ev bend beriya çapê ji nîvîsevanê Hawarê ji mi zu Rastedar re xwend. Cenabê Rastedar gote min: Li deşta Mûşê eşira belekan heye. Şevezê ez bûn mîvanê wan. Wan ji min re çiroka mil û zil gotiye; lê nayete bîra min. Xellkê belekan tev de pê dizanin. Tiştê ko tête bîra min Mil û Zil bîrayen hev bûn, pev çûn û ji hev vejetiyan.

Ji wan her du lawan navê yekî Mil, navê û din Zil bû. Mil û Zil gava vegerîyan mal û ev hal ditin li xwe heyîrî man; li şûr û kevanê bavê xwe gerîyan. Berf kolan û şûr û kevan ditin û terka çiyê dan û daketin deşte û ji xwe re du keçik revandin û zewicin. Kurdmanci ji van her du biran peyda bûne. Ji lewre eşir an mil an zil in. Lê tev de ji bavekî ne. Bavê hemîyan Kurd e, Kurde ko di bin berfendê de mir ».

Çiroka ko min li Zaxoyê bihîstiye ev e. Édi ez nizanim kalo ev çirok ji kî bihîsti bû. Belê ji yekî welatjorî. Welatjorî, ji kî bihîsti bû. Min ev tîst jî jê pîrsi. Kalo hema kutebir kir û gote min, ji pêsiyan....

Mr Seref di Serefname xwe de gava li esîle kurdan hûr dibe qala « mil û zil » nake. Lê bi awakî din li birêñ kurdan işaret dike û dibêje ko kurd tev de vedigerin du bavan: Bext û Becen.

Bi rastî Serefhan gava qala mîrekîn Hesenkêfe dike, bi hênceta vegera mîlîk Xelî — mîrekîn Hesenkêfe ji. Tevrizê — çel li Hisêñ begê becnewî dike û dibêje: « Di heqê becnewîyan de xudansîqe riwayet dikin û dibêjin ko Bext û Becen birayen hev û pismîrén hakîmîn Cizîrê bûn. Ji ber tîst hikmetê gelşek kete nav wan û her du biran welat di navbera xwe de lêk vekirine. Cizîr bû para Bext. Hesenkêfe ji giha Becen. Li góra riwayeteke din taşfeyen Kurdish, tev de zaroyen Bext û Becen in ».

Ez bi xwe dibînîm ko min di vê bendê de tu ronahîskê nû ne reşandîye ser mesela « mil û zil ». Bi tenê min hêvî heye pişti ko min ev mesele bi vê bendê tev da yêñ ko ser-wext in çira xwe bêxin ber mesela Mil û Zil û wê ji tarşîtiye xelas bikin,

HEREKOL AZIZAN

\*\*\*\*



BERTORPIYOREKE EMÊRİKANI DI HICUMË DE

## NEMA DIKARİ BÛ BIREQISE

Li 17ê Çiriya-paşin sala 1942an rojnameyên Arjantînê da bûn zanîn ko zabîteki erkanherbiyê, bi navê Swarло xwe bi şejderbê kuştîye û di mektûba ko di pey xwe re hiştî bû digot: Min xwe kuşt ji ber ko min xîyanet li welatê xwe kiriye.

Rojnameyên Arjantînê nema qala Swarло kîrine. Lî pişî midêkî rojnameke emêrkansı Şîkago Trîbyûnê çêl li vîna dikir û digot ko Swarло bû bû dostê artîsteke mecerî û wê artîstê jê xerşîyê erkanherbiyê dîzî bûn. Gava Swarло pê hesiyê bû artîstê terka Arjantînê da bû; Swarло ji ji ber vê yekê intihar kiri bû.

Bi rastî di meha flonê de artîsteke mecerî bi navê Mariya Kramenski hati bû Bwênes-Ayresê, payitxê Arjantine. Wê artîstê di gâzlnokê Bwênes Ayrasê de dixebeit. Mariyayê gelek elêhdarıra dewletên mihwerê dikir û dijân dida Hitler. Di nav mîstîriyên qazînoyê de peyayêniy mihwerê ji hebûn. Wan peyan pê qasîl ne dibûn û li xwediyê gaziñoyê radibûn.

Xwediyê gaziñoyê li Swarло gelek dostên hev bûn. Xwedî mesele goti bû Swarло û gaziñô Mariya xisti bûn bin himayeta wî. Bi vi awayî Swarло Mariya delal nas kiri bû û Mariya bû bû dostika wî. Herçî Maryayê pê dida erdê û elêhdariya mihwerê dikir û digot. Mecaristan di bin hikimê elemanan de mehiw bûye.

Lê piştre xuya kir ko Mariya delal ne neyarey mihwerê lê casûsa elemanan bû. Polşen Arjantîne herçend da bin pey ji tu şop jê hilnanîn ».

Tistê ko Şîkago-Trîbyûnê gotiye ev e.

Pişti meheke rojnameke Şîliyê [1] Ankayê nûçeyek belav dikir û digot:

« Berf sê heftian artîsteke mecerî bi navê Anayê gihaşti bû Santiyagoyê, payitxê Şîliyê. Ana gelek spehfî û xudan fen û sinhet bû. Giregirân payitxê ji bo dîtina wê her şey diçûn gaziñô Ramonayê. Wan giregiran dida her wasitayê da ko dostiyê bi Anê re girêbidin. Lî Anayê rû ne dida tukest. Ana bi yekî re dihate gaziñoyê, direqist û bêl ko bi tu kesf re xebér bide, digel mîrikê xwe vedigeriya otêlê. Ji bo wî mîrikî berf ewîli goti bûn mîrê wê ye. Piştre digotin birayê wê ye. Xelk lê ecêbmayî diman; dikirin ne dikirin lê ne

[1] Şîliyê û Arjantîn her du ji ji dewletên Emîrika nîvrô ne.

## GURÊ PİR

Dibén li nav Xidîrsor Di binhêla Kawê jor  
 Gurek bû bû pir û jar Pe ne dibûn raw û kar  
 Dîl gureki piştişin Pişti hal û xatiran Şeng û ollaş û narîn  
 Pişti hal û xatiran Şor kîrin her du guran Tu mîrekî xêrxwazî  
 Yê pir digot: birazîl Rawekê bo me daxl Sitra xwe li vir raxî  
 Rawekê bo me daxl Ser û peyan bi xêr kî Zikê mamê xwe têr kî.  
 Tezik da xwe gurê şin Gotê: mamê dûrebîn!  
 Tu kaleki dilçak t Malbata min nas nakî  
 Ger zani bî warê me Keleşîya karê me  
 Em rebir û mîrku jîn Xwîna neyar dimijîn  
 Fermû were li pê min Dê zani bî carek din  
 Selpen gurê piştişin Bi çavên xwe tu biblin.  
 Rabûn her du bi rê bûn Reya bajêr girtin çan  
 Yê pir bawer ne dibûn Lê ji serman li pê çan  
 Bazirganek li pêş din Zer bû gurê Piştişin  
 Rast ajo nav dewaran Peva hatine bi daran  
 Yê piştişin direvin Gis li yê pir diçivin  
 Gîhestinê di pa ra Léxistin j'xwe û xwe ra  
 B'zora lingan reviya Xwe avêt nav deviya  
 Dema birin dibûn sar Dest û ling jê bûne dar  
 Welê ma bû nîvmîri Dil jê xav bû bîhîrt  
 Raste wi hat gurê zer Hilmiştî û dîlawer  
 Li gurê pir silav kir Jê pîrsî hal û xatir  
 Yê pir çîrok jê ra got Dil û kezeb ji xwe sot  
 Derde gurê piştişin Hemî jê ra da zantî..  
 Wi got: mamê bexteres Ma te nînîn eqil û hes  
 Cawan gurê piştişin Yen wekti de dixapîn?!


Li tevdîra min binêr  
 Kurt maye, ker li pêş  
 Hemin kalê te biblin  
 Dê ji her kim ûrê dê  
 Wê vegera ser kerê  
 Dê biçin kuri û ker  
 Zû veger here mal  
 Zikê xwe tev hidin her  
 Min eciband ev zantîn  
 Kalê bê ker bîmîne  
 Hûn gûren zer ci şengin Her dem bi nav û deng in  
 Rast ji bi wê tevdîre Her du gur çan neçtre  
 Ker û kuri dikuştin Bar li erdê dîhistin  
 Kalo dikir barehar Her du guran göst dixwar  
 Gurê pir zik kir teşker Bi tevdîra gurê zer.

OSMAN SEBRI

dikarin nfzngiyê lê bikin.

Cejina istiqlala Şîliyê bû. Di seva cejinê de xelkê Ane di sefaretxana emêrkansı de dîti bûn. Ane bi zabiteki emêrkansı re direqist, li timobila zabiteki şîli siwar dibû. Axir bi zabitan re dida û distand.

Ma ci li Anê qewimi bû. Sibetirê zabitan di gaziñoyê de dor li Anê girti bûn. Anê digot ko gelek hejî esker û zabitan dike. Gava jê



## QEWEȚEN INGLİZİ ȄN MËKANIKİ DI TALİMGAEKE İNGİLÝSTANE DE

pirsin çire. Anê got: Bavê min û her du birayên min di ordiwa mecerî de zabit bûn. Gava şerê ûris dest pê kir bavê min û birayên min qe bûl ne kirin ko herin serê ûrisan bikin. Li ser vê yekê elemanan ew kuştin.

Li 11e Kanûna-pêşin midrê gazinoyê da bûzanîn ko Ane reqseke nû vê bireqise.

Giregirén Santiyagoyê û memûrên sefaretén biyanî te hatî bûn temasâ Anê. Di locekê de memûrên sefareta Arjantînê ji hebûn. Di nav wan de yekî bejinbilind çavén xwe li sehnê daçikandi bû.

Saet di dehan de perde rabû û Ana delal xwe şanî da. Xelkê qederê pênc deqîqan cepilk li hev dixistin û xuyabûna Anê şahînet dikirin. Di vê navê de mirovê bejinbilind yê ko di loca sefaretxana Arjantînê de rûnişti bû xwe ji locê zer kir û çû li ber sehnê rûnişt. Qey dixwest Ana bedew ji nîzîngî bibîne.

Anê dest bi reqisë kiri bû. Lê pişti bîhinekê xelkê didit ko reqisa Anê ne weke xwe ye û lingin jinikê li hev dikevin. Herçî di rêszen pêşin de rûnişti bûn diditîn ko gonê reqasê ji dicilmi. Ji xwe vî half gelek dom ne kir Anê ji temasageran ezir xwest û xwe da paş. Midrê gazinoyê da zanîn ko doxa Anê çûye û ji lewre xwe daye paş. Lê pişti deh deqîqan bi reqiseke ecüb dile temasageren xwe wê xwes bike.

Deqîqe bûne deh, bist, sih... Anê xuya ne dikir. Perde vebû û li şuna Anê midrê gezînoyê disan xuya kir û ji temasageran re da zanîn ko Ane gelek westiyaye û ji lewre çûye otêle; lê sibe ewê disan bireqise û temasager bi bilyêtén wê rojê dê bikarin bén temasayê.

Anê ne sibe, ne dusibe ne ji sésibe xuya ne kir. Lê rastî pişti çend rojan xuya kir.

Mirovê bejinbilind yê ko di loca seferetxana Arjantînê de rûnişti bû û piştre dakteki bû pêsiya sehnê midrê bistehî yanî emnilama Arjantînê sînyor Kalamati bû. Kalamatî da bû pey artîsta miceri Mariyayê. Mariya ko bû sebeba intihara zabitî arjantîni. Kalamatî seh kiri bû ko ew Mariya bi xwe<sup>2</sup> bi navê Anê di gazinoke Santiyagoyê de direqise.

Kalamatî hatî bû Santiyagoyê û da bû pey Anê. Anê an Mariyayê Kalamatî ji Bwênen Ayrêşê xwes nas dikir. Wê sevê gava ew di nav temasageran de dîti bû zani bû iş ci ye. Ji lewre Anê xwe ji sehnê da bû paş û li timobila xwe siwar bû bû.

Li otêle polisên şili û arjantînf li hêviya wê bûn. Lê Ane ne çû bû otêle. Heye ko ji nû ve di gazinoyine din de direqise û li zabitine din digere; nemaze yêñ ko pê re xerite û planêñ eskeri hene.

# TİŞTEN KO

BI MIN RAST Ü YEN KO NERAST IN

Divêt rüpelén Hawarê ji her xortê xwenda  
re vekîrî bin. Da ko xort bikari bin kanêñ  
heş û biraniyên xwe pêş teva welatparêzan  
bikin Nemaze divêt herkes bi şewa cihe xwe  
binivse da ko pîrsen zanaki bêne neqandin.

Divêt em li hemî deverên welêt agah bibin.  
Ji ber ko dîrok, çîrok, adet, bûyer û kirdeyên  
du eşîran ne wek hev in. Lê heke nîvisar ne  
hejâyî çapkirinê ne hingî gerînendeyê ber-  
pîrsiyar dikare wê pûç bike. Ji xwe me jî divêt  
kemasiyên me nayine belav kirin. An ne Hawar  
ne qurban e ko merov li ser xwe bigertine û  
li ber xwe deyne. Lewre her xort divê ji  
xebata welet pêmende nemîne. Herwektî mîrê  
mezin gotiye Hawar kursiyê mîlet e, herkes  
dikare hilkiye ser û béje.

Mirovê welatperwer divêt di bêrika wî de  
du mîrêk hebin. Bi yekê li kemaniyên xwe  
binêre û bi a din li xebata hevalan binêre bêl  
ko kemaniyên hevdû bijmérine.

Tukes bê kemani nîne. Heke em temam  
bûna, işe me ji temam dibû. Belê, bi dilê min  
kesê ko paşgotiniya hevalan bike, çiqas xebata  
wî ji hebe ew tete sotin. Ji lewre mirovê dîlrast  
hayî ji xwarî û dilreşiyê nîne.

Herwektî hate gotin: dostê kubaran nîne.  
Divêt mirov ji xorîn kurd re dilnerm û dilo-  
van be. Heke qencî nekê ji, bi gotinên xweş  
û bi xérhatinê nav di wan bide, da ko dilê  
wan perwaz bide û hevîna wan dijwar be.  
Ne ko wan dilbirîn vejerîne.

Behwer bibin, pir caran ez dixwazim di-  
yarê hevalan bibim. Mixabin, ez ditirsim ko ji  
şexsên wan evina min wê sar bibe. Ez qîmlîşî  
xwe nakim, ji ber ko çend caran rast hatime.  
Hêvi dibe ko em vê ji nav xwe rakin. Nema-  
ze ev ne karê mezinan e. Belê divêt em ji  
mezinan re sernexîn bibin. Lê divêt ew ji ji  
me re dilnerm û dilovan bibin. Piçûk dest û  
lingên mezinan in.

Divêt em hevalên xwe ên welatparêz zêde  
bikin. Hevalên kevnedar dikarin wan li xwe  
bikine bar; herwektî ferza nîvîjê. Belê divêt em  
xorîn nû bikin hogirên xwe û wan bînîn ser  
riya welatparêziyê da ko ew ji wek me dilbi-  
rin û dilşewat bibin.

Ji her kurdî re kemasiyê mezîn e ko tipen  
xwe nehewise û xorîn nû hîni tipen kurdî  
nekê. Hînbûna tipen kurdî divêt şerît kurdîtiyê  
bête hesêb. Ma iro tu mîlet heye ko ne xudan

# BESTA WELEATI

Ey welat serbest bî herdem tu bijî

Bilind bit Alayê rengin bi hejî

Em hemî gorî te bibin tu hejî

Ey welat her bijî bijî

Kurdistan her bijî bijî.

Ey welat te hene zor sér û piling

Ey welat te hene Rostem û nehing

Dê revin neyârên bê cerg û cîving

Ey welat her bijî bijî

Kurdistan her bijî bijî.

Ey welat serhelîn bi te roj helat

Pavêje şîniyê xortâ bû xebat

Dê te paqîj ken dê te kin kelat

Ey welat her bijî bijî

Kurdistan her bijî bijî.

Hilo rabin ser xwe ey gencen delal

Helkêşin elmasa helavên metal

Derbêxin dijminf j' welatên şepal

Ey welat her bijî bijî

Kurdistan her bijî bijî

Me ne vêt ci cara jîna b'jengî

Here dijmin zibe here bê dengî

Em hemî lesker in li roja cengî

Ey welat her bijî bijî

Kurdistan her bijî bijî.

**Amâdiyê: 10. 8. 1942 MELA ENWER**

tip û elfabê be. Heke hene, ji heynîne nesîba  
wan nîne. Ev hînbûna ji divêt bi temamî  
çebîbe, xwendin û nîvsandin. Tişte nîvco ji  
kemân re ye. Kurdiî tiştên kêm qebûl nake.

Ji xortê xebatker re gerek e nebje ev  
dibe ew nabe. Tişte ko nabe Yezdan ne afiran-  
diye û ew ne xistiye bîra mirovan. Bi tenê  
tiştine zehmet, barîne giran hene. Mîrê qenc  
divê xwe bide ber barêن giran.

Li dînyayê binerîn. Xorten biyant, ji bo  
welatê xwe bi siwanan xwe bera jêr, bera êgir  
didin, wek perwanan.

Heya nebtîn rençê Meleyize bi şetrence  
Kesek nabe me piştîmîr Mirov nabe gur û sér  
Herçî tehîlî dewa ye Şîrani tim bela ye.

**H. HİSYAR**

**RONAHÎ** — Gotinên mîrza Hîsyar rast û geleb hi  
cîh fî semit in. Lê ji şîretkeran re divêt berî herkesi ew  
bi xwe bi şîretên xwe ve herin. Ji lewra me ji mîrza  
Hîsyar divêtin ji me re tarix û teşkilata eşîra xwe û  
yên eşîren ko pê dizane binivisine. Di Hawarê de di  
babetê de nimûneyek ji heye. [ Ji eşîren Botan Je  
liyan. Hawar: 34 rûpesi: 4 ]

## HINEK JI HENEK

DI DIBISTANË DE:

Mamoste — ( ji şagırtan re )  
Erd di dora rojê de digere.  
Di dora erdê de çi digere?

Şagirteki: Ezbenî, seyah.

DI DA'RÈ DE:

Memûrekî piçûk hebû. Jina  
wi dikir biweliide. Memûr çû ji  
mezîne dairê izna xwe xwest.  
Mezinê wi ji bo du rojan Izna  
wi da. Lê mérîk pişti çar rojan  
vegeriya dairê. Midîr jê pîrsî.

— Me izina te ji bo du rojan  
da bû, tu çar rojan ne  
hatî dairê.

Memûr — Ezbenî jina min  
ne yek lê du zaro anine.

ARIKARI BIJŞKAN:

Mixtarê gundekî nexwes  
keti bû; bi nexwesiçe xedâ.  
Di vê navê de yeki bajarlî  
bû wi gundi. Bajart gava bi  
nexwesiya mixtér besiya gote  
jina wi: Ma hon çire diktokeki  
nayînîn ser

Jina mixtér — Ji me re  
çetir e ko nexwesên me bê  
arkiriya diktör himirin.



JI BOMBAVEJEN EMERİKANIYE LİBERATOR

BİNAHYA KORAN:

Du mirovén kor li ber de-  
riyê dêrekê li hev sekînî bûn  
â xeber didan.

Yekî digote edin — Min  
Lihîsticîe ko tu diktî keça xwe  
bîzîwîcînt

— E din — Belê min jê re  
xortekî bijarte peyda kîr.

Korê pêşin — Te ji xelkê  
pîrsî, hal â hewalê wi seh kîr

— E din — No, gava min çav  
pê kîr, hema min ew eciband.

DI MEHKEME DE:

Evkat ( ji qazî re ) Mitehi-  
mî ko li ber we sekiniye

sezayı rehma we ye. Belê di  
cizdanî de 1000 frengê din ji  
hebûn, lê dest ne daye wan û  
bi diziya 50 frengî bes kiriye.

Mitehim dest bi girl dike.

Qazi ( ji mitehim re ) Welê  
dixuye ko tu ji emelê xwe pos-  
mant; li ber dikevi

Mitehim — Ma çavên min  
kor bû bûn. Çawan bû ko min  
ew 1000 frengî ne ditin.

HER DU JI ZEWICÎ NE:

Kumandarê tabûrekê digel  
jinikekê di ber qışla tabûra  
xwe re dibore. Yekî ji eskeran  
li wan dînihêre û  
dikene. Çawîş jê re  
dibêje: Kuro ma çire  
dikenî, her du ji zewi-  
ci ne.

Esker Ji kengê ve?

Çawîş — Ev deh sal  
in kumandar zewicî ye.  
Herçi jinik vê paşiyê  
zewicî ye; hêj ne bûne  
şes meh.

HER DU JI MEHRÛM:

Dê — ( ji kurê xwe  
re ) Xuya ye te dolab  
vekiriye â hingivîn xwa-  
riye. Di taştiyê de ezê  
te ji hingivîni mehrûm  
bikim.

Kurik — Yadê tu  
bi xwe ji tiwê jê mehrûm  
bibî; ji ber ko di fira-  
xê de min tiştek ne  
hiştîye.



ESKERÊN BRITANIYE CEJINA MILADE DI ÇOLEK LIBYAYEDE ŞÂTINET DIKIN

YARIKER

## LI WELATÊ ÇINÊ

MEHKEMÊN WÉ ÇAWAN EDALETÉ BELAV DIKIN

Seyahê fransizi diktör Albér Jérviye pişti ko li weletê Çinê geriya, der heqê mehkemên Çinê û edaleta wan da pir tişti nivisine. Ji ber ecêb bûna wan nivisanan, me çendek guhastin kurdmancı; da ko xwendevanenê me agahi vê edaleta han a ecêb bibin.

Li bajarê Wan-şinê bi navê Çanc-lo-sen miroveki belengaz, li pêşberê qışla general Lo şirani difirotin. Rojekê serberzeki ji leşkeren general Lo sendûqa şiraniyê şikand û hemî xwar. Xwediye şiraniyê di dergehê qışlê da sekinti û bi çavén bi hêsir li benda hatina general ma. Gava general Lo hat û giliyê mîrik bîhist gelekti dilê xwe pê şewitand û bi xwe ra bir qışlê. Ji bo ko ê şirani xwarî nas bike. Hemî leşker qor kirin û gote mîrik dizê xwe nas bi ke.


Mîrikê şiranifros di ber qorêñ leşker ra çû û hat. Di wê navberê da li pêş serberzeki hineki sekinti. General bi dengeki xurt got e:

— Ma ne ew e?

Bê ko şiranifros dizê xwe nasibe, bes ji bo ko generel ne xeyidne serê xwe hejand; yanî ko ew e. Di ci da generel emira kuştin û qelaştina zikê wi serberzi da; lê tu şirani di zikê serberzê kuştı da ne ditin.

Generel rahişte milê şiranifros û di ber qorêñ leşker ra çû û hat. Digote mîrik: Divê, vê carê xwe şas neki û dizê xwe binast. Di nişkava deng bi şiranifros, ket û got: ev e ve e.

Rahiştine milê serberz ekl din û di nav hevalan da bi derxistin. Vê carê serberz li xw na û got: min kiriye.



Di Efrîqa bakur de balaflîrvanenê ingiliz beriya ko bi hewa  
bikevin cebîrhanenê xwe dibin

Pişti ko general Lo emra kuştina wi seberzi ji da; vegert ser şiranifros û pîrst ka heqê şiraniya wi çiye, dema ko zani xisara wi du riyal in sekinti û got:

— Ez ji hemî kirên leşkeren xwe i berpirsiyar im. Şerme ko yek çavê xwe berde male rebeneki hôle.

Di berikü xwe da du riyal bi derxistin û dane mîrik; lê paşê vegeri ser û got:

— Te heqê xwe stand; lê tu bûyi sebebê kuştina miroveki béguneh Divê di ber wi va jî tu bêyi kuştin.

Bi şaretékê ji destê general, serê şiranifrosê reben hate jêkirin.. Hingê zabit ber ve fermandarê xwe hatin û bi vê edaleta han piroz kîrin.

Di navâ deh deqiqan da sê mirov ji bo çend perçê şiraniyên qirêj hatin kuştin, bê ko dilê kesi bi wan bisewite.

## XWİNIYÊN BI DEREWAN

Diktör Jérviye dîbêje: Rojekê jineke ingilizi li ser rê hati bû kuştin. Hakkîm Çinê ê eskerî, hemâ xwîniyê jinikê girt û bê mehkeme da kuştin. Ji bo dilxwesiyê, ji qonsulê Ingiliz ra got: heke bi kuştina xwîniyê jinikê dilê te rihet ne bûye, niho ezê çend hepsiyên çini bînim û li pêş te bikujim...

Hin ji vê ecêtir, carekê du kegeyên emêrikani li érdimeke Çinê hati bûn kuştin û xwîniyê wan ne hati bû nasin. Ji bo ko qon sulê emêrîki nexeyide, hakkîm eskerî ê wê érdinê da zanîn ko xwîni girtine û qonsulê emêrîki jî, ji bo ditina mehkema wan. vexwan

Roja mehkemê sê merivén çini anîne pêş mehkemê û wan jî bi devên xwe gotin: Me her du keşe ji bo dirav ên wan kuştin. Li ser vê gotinê her se jî kujirandin

Pişti çend mehan xwîniyên bi rastî hatine nasin û bî darve bûn.

Dema li ser her sê meriven ko berê dabûn kuştin ji hakkîm eskerî hate pîrst; got: Ji bo ko qonsulê emêrîki ne xeyide, min sê feqîr anîn û pêra bazara xwe bîrl. Da ko ew li pêş mehkemê bêjîn me keşe kuştin û ez jî di ber wê va, cende kên wan di tabutên gi-ranbiha da veşerim...

OSMAN SEBÎ

# HINDIK RINDIK

DI ROJEKÉ DE 174 VAPOR:

Emeleyén tersaneyén emérikanî, vê paşiyê ( Labor-Day ) yant ( Roja-xebatê ) şalinet kirine û di wê rojê de 174 vaporên nû daxistine behîre. Di nav van vaporan de her textil keşti hene, cenkeşti û keştiyên adeti, ji bo guhastina eskeran an aleteren cengê, cebirxane û tiştine din. Di nav wan de nemaze vaporan 10500 ton hene ko emérikan ji wan re « keştiyên serbestiyê » dibéjin. Disan di wê rojê de wan tersanan bî xwe hewdên 49 vaporên nû li taxokan siwar kirine.

## TONÈLEKE JAPONYAYÊ:

Japonan ji mêj ve dixwest her du giravêñ xwe û bingehin Honde û Kiyoçiyoyê bi toneleke binbehîrin bigehinin hev.

Proja vê tonêlê a pêşin di sala 1897an de di meclisa japoni de hati bû mizakere kîrin. Lê meclisê ew proje bi tenê di sala 1918an de tesdiq kîr. Mihendisan pişti pênc salan dest bi kolandinê bikirina; lê zinzala sala 1923an ne hîst ko proja wan here seri. Mihendisan di sala 1936an de ji nû ve dest bi xebatê kîr û di pêac salan de xebata xwe temam kîrin. Tê de sê milyon emel xebitine û 50 milyon ley lê çûne.

**Dirêjahiya tonêlê 19 kilo-métir in. Japonan pişti ko tonêl kolan û tê de rêne ereban çekirin, röhésinek ji lê danin. Ev bûne çend meh trênen rëwingiyân tê re diçin û tê.**

87 ZAR Û ZIMAN:

Mibesireki emerîkant bi navê Dr. Bilyé pişti ko hînt zimanen ewropayî û bingehin bû bû, çû bû giravêñ Filipinê û tê de bi cih bû bû.

Dr. Bilyé di nav 60 salt de hînt 87 zar û zimanen bûye. Ji lewre yêñ ko bi heft zimanen dizanî bila nebéjin em bi gelek zimanen dizanî.

ÇEKÊN NÛ:

Li 21ê Çiriya-paşin 1942an gava êrişa rûst ya Zivistanê dest pê kir ürisan da zanîn ko mitralyozeke nû bi kar existîne û ew mitralyoz bi elektriķe dişixule û di deqiqê de 2500 beriqî berdide.

Li 27ê wê mehê radyowa Berlinê da zanîn ko qewetên mihwêrê di qada serê üris de mitralyozeke welê bi kar existîne ko ew timatika-elektriķi di deqiqê de 3000 berikt berdide.

GIRTINA HÈVÉ:

Li cem me gava hêv tête girtin xelk li def û erebanan didin; tifingan berdidan. Çire? Efsaneyê gotiye hêv tête girtin ji ber ko hût dev lê kiriye û dike wê daqurtine. Ji lewre xiocirê dikin da ko hût dev ji hêvê berde.

Li bakurê Ewropayê wela-tek heye jê re Skandinavye dibéjin ( Iswêc û Norvêj ). Fesana wi welati dibêje ko li ezmanan du gûrên fêris hene. Wan guran daye pey hêv û rojê. Dema ko gur gihaştine yekê ji wan stérkan; hêv an roj tête girtin. Ji ber ko ew gur dev li wan dikin. Skendi-navi ji wek me, dikin qırqır hetanî ko gur dev ji hêv an ji rojê berdidiñ.

XEBERGUHÈZ



Isal aluceyên Ingilîstanê gelek boş hatine. Ewçend ko pişti ko ên rindighaşti û bijarte di sükân de firotine bi ên mayin kîrin ko riçal çêkin. Lê ên mayin hinde zêde bûn ko tonekeyên berdest téra wan ne dikirin. Li ser ve yekê ên nîvxav bijatinjû ew xistin denine mezin. Aluceyên nîvxav heta Zivistanê gihaştine û bûne fêkine xwarbar. Xelkê Ingilîstanê vêra vê tevdîrê li vê Zivistanê fêkine ter û taze dixwin.

## MIST - AWIK

Li Séwerekê bi navê Bûcêx eşrek heye ko li bakur û roavayê bajêr di kûntara çiyê da rûdinin. Pişf ko di vê eşrê da mala Hec-Eli rabûn û mezinatiya eşrê girtin dest xwe, rîspî û pêşiyên eşrê bi arikariya vê malmezina nûh, hêdî hêdî ji kûntarêñ çiyayê Bûcêx bi derketin û berê xwe dane gundêñ deşte ên fireh û têr erd. Kijan mezin an rîspî ji ên Bûcêx gava ji çiyê derdikeyin û dihatin di destê da cî digirtin, bi arikariya malmezina Bûcêx mala Hec-Eliyan destêñ xwe didane ser gundêñ dorhêlê û pişf demekî ew ji xwe ra dikirin mal. Bi ser da çend malêñ búcahan ji dixistine nav xelkêñ gând ên binect.

Vê yeka han bi carekê këfa eşirêñ deşte revandi bû û bi çavekf rihet li vê kira búcahan ne dinérfin. Demekî dirêj ne ajot ko gund û eşirêñ deşte li ser búcahan bû bûn yek û ev yekîftî bi sond û peymanan xurt kiri bûn. Di vî deraxî da bû ko bi navê Mist-Awik rîspiyekei Bûcêx daktei bû deşta jérîn û di ber Ferêt da bi navê Beremaniyê gundek ava kiri bû. Gund avakirina Mist-Awik di vê demê û wî cî da bi carekê eşirêñ dorê rakîr bûn ser lingan. Pişfî ko di navbera Mist-Awik û gundêñ dorê da çend seren bigûk bû bûn. Rojekê di nişka va, gund û eşirêñ dorê, bî qasî çarsed peyayî civan-di bûn û bi ser Beremaniyê da girti bûn.

Di gundê nû da ji Mist-Awik û çar xulaman pê va, kes tine bû. Li pêş vê tevdîra neyar a bê eman, Mist Awik tevf xulamên xwe, derê hewşê li ser xwe dada û di xêñf da asê bû. Neyaran dixwest berî ko gaziya Bûcêx xwe bigehîne ser Mist-Awik, salê wî bindest bikin. Ji bo vê yekê, çav dabûn êrişan. Mist-Awik ji, ne mîrê ko bi êrişen neyar bigefiliya, her çar xulaman jê ra tifing dadigirtin û wî ji her bi singa neyarêñ êrişvanî da vala

dikirin. Bi qasî ko Mist-Awik mîrekî çê bû; ewçend ji nîşandareki xedar bû. Bi wê nîşandariyê bû ko kes, ji erişvaniyan negihandi bû xwe. Ya deverû di erdê ra dikirin û nema radibûn; an ji bi birfneke xedar li hevalêñ wî vedigerandin.

Wê rojê heyâ évarê û bi şev ji heyâ sibê êrişen neyarân li pê hev bi ser Mist-Awik da diçûn. Lé tu êrişvanî ji sînorê hevalêñ xwe derbas ne dibûn û hemî raste dongiyeke kirêt dihatin. Dema şev ronf bû û tîrijen royê xwe berdane ser xaniyê Mist-Awik, mîna ko kerîyek pezê res li dora xêñf mexel be, cendekên êrişvaniyê neyarân welê deverû ramediya bûn.

Hîngê halê Mist-Awik ji, ji yê neyarân wf ne pir çaktır bû. Ji ber ko, herçar xulam hatî bûn kuştin û bi xwe ji, bi deh gulan birfîndar bû bû. Lé, van birfnêñ ji dil û kezebeh dûr, ew gûrê qol di ser lingan da ne xisti bûn. Wi her borîn bû û nav di xwe didan, bi vê serê neyarân xwe germ dikirin.

Kebera vî şerî giha bû Bûcêx û wan ji gaziya xwe dicivandin da ko Mist-Awik ji hesarê bi derxin. Neyaran şelpa búcahan dizanî bû. Çi gava bigehîstana ser lecê, dé Mist-Awik xilaskiranâ û xwîna hinde mîrén wan li tinê biçûnya. Ji bo ko pîsiyeke wa ne gîhînîn xwe, dixwestin gene Mist-Awik bigirin. Li ser vê ramanê — dûrlî rezana şerevanîyan — agir berdane goma pêz, ya ko di rex xêñf da bû. Pişfî du saetan egir çarmedorf xêñf girti bû û li ser banê xêñf serê Mist-Awik di nav gurik û dûmanê da dixweya. Wî dîsa wekî berê bi borîn û halan, serê neyarân xwe dikir. Wê gavê serekên neyarân gazi Mist-Awik kirin û gotin ê:


— Bextê me ji te ra, bi derkeve, em te na-kujin; lê emê te hêşîr bigirin.

Mist-Awik bi dengekf box li wan vegerand û got:

— Ma ji we ra ne serm e ko hon vê reya teres didin ber min!. Ma kîngâ sér bi xweşî hatine girtin, ko hon ji fro bigirin? Şewitîna di nav agir da, bi qasî ser-nizmiya dîliyê ne dijwar e...

Lê sed mixabin ko gaziya Bûcêx di demê da ne' gîhfête Beremaniyê û paşê di nav şewatê da li hestiyên Mist-Awik dîgerfin.

OSMAN SEBRÎ



Jİ BALAFIRÊN FRansa ŞEREVANÎ YEKE BOMBAVÊJ

# ÇIROKA

## SEYÊN BIRÎNDAR

Vê Patzé me nêçira kofesiran di nav kendiran de kiri bû. Kendir gelek himbiz bûn û seja min gava tê re dicû qamışen kendiran li çavên wê diketin. Pişti çend caran çavên seja min kul bûn. Min ew bire eczexana taxa me da ko ez jê re dermanekî binim. Xwediye eczaxanê, Mihemed efendi Qenewati, gava bi işe min hesiya xwe da ber û gote min:


— Tu çire dermên bi xwe re bibî. Ez gelek hejî seyan dikim. Hero seja xwe bîne nik min ezê çavên wê derman bikim.

Mihemed efendî pişti ko ji dermanekî çend dilop niqitandine çavên seja min, ji nû ve gote min:

— Bi vê hêncetê ezê ji te re çiroka seyekî bibêjim.

Berf şes salan, hingê ez li jér li Ernûsê dixebeitim. Rojekê ez di eczaxanê de rûniştî me. Min dengê seyekî kir. Se ne diret lê dinalt. Ez derketim derve. Seyekî birîndar li ber derî veketi bû. Timobilekê pê lê kiri bû; heywan dikult. Min derman û penbû anî, birîna sê şîst û péçand û hinek nân ji da-yê. Qederê 15 rojan min seyê xwe derman dikir û nan dida-yê. Seyê min rabû ser xwe û li ser lingên xwe geriya. Min û seyê xwe bi vi awayî du meh bi hev re borandin. Rojekê min dit seyê min xwe winda kir û li min xuya ne bû.

Şes meh ketin navê. Disa rojekê ez hatimi eczaxanê vekim. Çi bibinim, seyê min e, sekî din ji pê reye. Seyê kevin dûvê xwe hejand, nîzingî li min kir û sekini.



Keleheke firolek di destegahê de. Emelê li baskêni wê siwar bûne û hin alet û - hacetan lê siwar dikin.

Min bala xwe da, seyê min carekê li min dînihîre, çavên xwe ji min badide û li hevalê xwe temaşa dike. Qey dixwaze hevalê xwe şant min bide. Ez bê hemtê xwe li hevalê wi hûr bûn. Çi bibinim; hevalê wi birîndar e. Ez ketim eczaxanê û bi şûşekê û hinek penbû li seyên xwe vegeriyan.

Seyê kevin gava çav bi şûşê û penbûyê kir, xwe avête ser min û destê min alastin. Eşkere bû ko seyê min hevalê xwe anî bû nik min da ko ez wi ji derman bikim. Birîna hevalê wi ne ewçend xedar bû; di nav çend rojan de sax bû.

Pişti çend rojan her du san xwe nebihisti kir û min ew nema ditin.

NÊÇİRVANÊ HAWARÊ

Gandî sergevazê Hindistanê û bi nav û deng vê pasiyê û ji nû ve dest bi rojiyê kiriye. Gandî carê ko dikeve hepsê dest bi rojiyê dike. Par wextê ko kongra Hindistanê çêbû hikümetê Gandî û hin hevalen wi girtin û ew kiran hepsê. Gandî herweki berê dikir, vê carê jt, ji bona ko bête serbest berdan, dest bi girtina rojiyê kir. Lé dibejin ko vê carê Gandî nema dikare, û ji rojiyê geleki têse. Sergevazê Hindistanê geleki li xwe şkânandiye û qels ketiye. Lé Gandî rexma her tişti de rojiya xwe de pê dide erde û naxwe.

Di meqamê protestoyê de an bi sebebeke din roji-girtin ne tişteki nû ye. Ev adet ji mêt ve di nav mirovan de heye. Lé mirov zû zû ji néz û birçnan namire.

Belê gelek caran tête bîhistin ko fnsan an heywanin ji sermê qelline û mirine. Lé di wextine adet de kêm caran hatiye dîtin ko mirov ji néz û birçnan mirine. Ji ber ko fnsan mideki direj bi tenê bi vexwarina avê ji dikare bijî.

Ji xwe li gora pisporan çaryeka tişten ko em dixwin besf me ye. Sê çaryekén din zêde ne û ew zêde li me nayê, em jê tu fêdê nabînin. Ji ber vajî ve zêde ji bedena me re ze rer e û jê nexwesiyyin çedibin. Lé pir-xwarin büye adet [1].

Bedena mirov herçend teknik û zirav e ewçend ji xurt û qahim e. Mirovê ko daye rojiyê hetanî ko ji bezê wi, ji sedf 97, ji kezeb û tihêla wi ji sedf 30 û ji wersèle û edeleyên wi ji sedf 50 bîhelin dikare bijî û bi tenê bi windakirina van mişdaran dimire. Herç dil û damar, rojî li wan

[1] Ji mêtrot botî ve yek car ne welê ye. Jê ve, ji xwe têr-xwarin nine lê bes-kirin büye adet..

## ROJÎ NÉZ Û BIRICITI

hikim nake, ew heta dawiyê weke xwe dimînîn.

Em bén ser mirovên ko bi girtina rojiyê deng dane. Di nav wan de é bi nav û dengtir û yê ko ji hemiyan bêtir nsîngî wextê me ye Mak Swêni ye.

Mak Swêni, di İrländayê de waliyê Korkê bû. Di sala 1920an de xelkê İrlândê li tacâ Ingîstanê rabû bûn û mixtariyeta xwe dixwestîn. Mak Swêni bû bû hevalê asîyan. Li 12ê Tebaxâ sala 1920an hikümetê Swêni girt û hepis kir. Mehkemê du sal lê hikim kiran. Mak gava ji mehkemê vegeriya bû hepisxanê goti bû: « Heta mehekê ezê ji vê hepis an zindî an mirî bi derkevin ».

Ji wê rojê ve Mak dest bi rojiyê kir û tiştek ne xwar. Bîjîşkan şîret le dikirin û dîgotin ki jiyina wi de talukê deye. Lé Mak guh ne dida wan û li ser gotina xwe disekint.

Halê Swêni roj bi roj xerabir dibi. Xweha wi rabû û ji serekwezir Mr. Loyd Corc re telêgrafa jérin sand: « Birayê min waliyê Korkê di hepisxana Brisktonê de li ber xwe dide. Heke birayê min ji nézan di hepisê de mir, mîletê İrlândî dê te û hikümeta te ji mirina wi berpîrsiyar bizanîn ».

Loyd Corc hîngê li Swîçré bû. Li xweha Swêni bi telêgrafa jérén vegerad: « Hikümet nikar waliyê Korkê bi hênceta rojiya wi ji hepisê derfne. Ji ber ko heke me ev kir, hepsi tev de we bidin rojiyê û wê bixwazin bi vi awayî ji hepisê derkevin ».

L 20ê Çiriya-pêşin édi Swêni ji bîr ve çû bû û bi dora

xwe ne dihesiya. Bîjîşkan hinek ava goş û çend dilop konyak dan-ê. Swêni pê hisyar bû û bi xwe hesiya û bijîşk ji nik xwe bi der kîrin. Li 25ê wê me hê yanî pişti 73rojîn birçtiye, Swêni di hepisa xwe de mir.

l eriya mîlada İsa pêxember bi 323 salan Dîmokrîtsê yewnanî 40 rojî rojî girti bû. Dîmokrîtsî di wi 40 rojî de miran û hingivîn bîhin dikir.

Carekê hepsiyeke di hepisxana Tûlozê de 63 rojan rojî girti bû û pê miri bû.

Disan Dr. Taz 40 û Eleksendr Cak 50 û yekî talyani bi navê Marlanî 50 rojî rojî girti bûn. Heçî mîrikê talyani beriya ko dest bi rojiyê bike 5 kflö goş, qazek, mixdareki boş hesinatî û kodek gwîz xwari bûn. Jê pêve Marlanî di wextê rojiyê de jî av vedixwar.

Di nav mehkûmîn idamî de gelek peya têne dîtin ko pişti hikimî idamî xwe ji xwarin û vexwarinê mehrûm dîkin. Ji mehkûmîn idamî yekî emêrîskan bi navê Edward Cons 35 rojan rojî girtiye. Landrûyê fransiz, yê ko deh keçik kusti bûn wî ji pişti hikimî idamî dest bi rojiyê kiri bû.

Lê vê paşiyê rojîke din baw büye; rojiya derman. Yen ko ve rojiyê digirin de wextê rojiyê de wek mîrikê talyan û li gora këfa xwe avê vedixwin; lê tu zâdf naxwin. Dibejin ko bi vê rojiyê her texlitê nexwesîtene derman kîrin.

Nüredin Üsif, nîvîsevanekî Hawarê ji ber eşeke rûdiyan, se caran ev rojî girtiye: 11, 15 û 21 rojan.

Ji van pêve mirovin hene, ji roja ko bîrewer dibin, heta dawiyâ emirê xwe rojiyê digirin. Lé divet rojiya wan ne ewçend çetin bit. Ji ber ko ew bi sev bi qasî sê çar peyan dixwin, heta nîvô dinînîn û di wextê mayîn de rojiyê digirin.

EIJISKE HAWARE

Herwekf li hemi Ewropa-  
yê, li Parisê ji xelk ji ber zad  
û qût di zehmeteke giran de ne.  
Dibejîn ko xelkê Parisê di şehnişnan de tev bigire. Lé welê dixuye ko lîwan ji téra  
mîrşikan û di nav xaniyan de heywanine berêz ne dikir; jê re erdeki jê firehtir  
çarpê bi xwedî dinikin.

Di nav hinên  
din de yekî mi-  
hendis ji xwe  
re kutikekf be-  
razan peyda  
kiri bû û ew  
kiri bû hemama  
xaniyê xwe û  
ew bi xwedî  
dikir. Kutik roj  
bi roj mezin  
dibû û mihen  
dis këfa xwe jê  
re tanî. Bele  
kutik wê bibiwa  
berazekf férîs.  
mihendis ew  
serjê bikira û  
bi göstê wî  
qellî û hiskegoşt  
wê çekira; çi  
beytiyarf....

Kutik ewçend  
mezin bû ko di  
hemamê de ne-  
ma debar dikir.



## LI ŞÜNA BERÊZ

### JÉ RE SEKİ FÉRIS ANÎ BÜN

### DUK OF KENT

Mihendis berazê xwe ji he-  
mamê derêxist! û ew berda  
lîwanê da ko bikare serbest  
diviya bû. Ro-  
jekê berazê me  
derf vekirf dft,  
jê derket û çû  
li erdeki fireh  
bigere.

Mihendis gava  
pê hesiya gelek  
li ber ket û rabû  
flanek di roj-  
namekê de bel-  
lav kir. Mihen-  
dis di flanê de  
digot: « Min  
heywanekf çar-  
pê windakiriye;  
heç ew peyda  
kir û ji min re  
ans eze wî pê  
re bi nîvî par  
ve bikim ». •

Sibetirê zila-  
mekî li deriyê  
mihendis dida.  
Bi wî zilamî  
re seyekî férîs  
hebû; heywa-  
nekî çarpê.

### HESENÈ MISTÈ

Dûkê kentê birayê qralê Ingilistanê bû. Dûk wek piraniya mîrekên Ingilistanê zabitê deryavaniyê  
bû. Dûk, beri çend inehan bi balâsireke behri diçû İslandyê, da ko li wargebêñ giravê û li halê  
balâsirvanêngîlzi hûr bibe. Balâsira Dûk bi rê ve ket û Dûk emîrê Xwedê kir. Miletê ingiliz  
gelek li ber Dûkê xwe ket. Lé ji aliyê din pê iftixarji kir. Ji ber ko Dûk di xizmeta millet û  
welatê xwe de mîri bû.

## ROJA NÛ

Xwendevanêñ detal mîzginya me li we. Pişf Hawar û Ronahiyê honê bi rojnameke kurdî, Roja-nû  
ji sa û këfxweş bibin. Hejmara vê rojnamê a pêsin  
di van çend rojan de wê derkeve. Roja-nû wek Hawar  
û Ronahiyê ne bi tenê edebî û cûvakî ye. Lîbelê  
Roja-nû rojnameke siyasi ye. Hônê tê de ji her texlit  
nîvsaran pêva danezan û nîyeyen ser ên dawin ji  
peyda bikin. Ji nîo de hon dikarin kiriyare Roja-nû  
bibin. Ji bona vê yekê ji hema bi kartekê nav û adrêsa

xwe ji xwedîyê wê re bidin zanîn. Eve adrêsa Xwedî:

Dr. Kamiran Ali Bedir-Xan

Xwedîyê Roja-Nû — Avahiya Ebû-Esfîf

Meydana Bircê — Bérât

Ji bo postê bi erebî „divêt holê bête nîvisandin:

الدكتور كامران على بدرخان

صاحب الجريدة الكروية « روزانا »

بنية أبو عفيف - ساحة البرج - بيروت

Kiriyariya Ronahiyê : 500 qirûşen sûri.

Xwedî û gerînendeyê berpirsiyâr : Mir Celadet Alf Bedir-Xan . Şam-Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emir Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas-Syrie